



قصة غينجي

للكاتبة اليابانية موراساكي شيكيبو

Çêroka Cîncî ya Morasakî Şîkîbo

Cankurd- 26.08.2013

Wekî dixuye, ev çêrok romana yekemîn e di dîroka wêjevanî de, ne tenê li Japonê, belku li teviya cîhanê. Xanima Japonî **Morasakî Şîkîbo** ku nivîskara vê çêrokê ye, dora 973 Zayînî, di malbateke xanedan de ji dayîk bûye, ku piraniya endamên wê malbatê di karmendiya bilind a dewletê de kar dikirin. Navê lehenga romanê jî wekî pêşnavê wê ye. Roman bêtîre ji 1200 rûpelan, û bi sedan kesyetî têde hene, hema hinek kêmaniyên wê yên zimanî jî hene, û di avahiya romanê de jî kêmkasî hene, lê ji ber ku nivîskar jineke û pir bi wêrekî li ser serxwebûna jinan û azadiya wan ji deselata mêran di romana xwe de nivîsiye, lew re ev roman navdare, ne ji ber ku ew kevintirîn romana cîhanê ye ...

Jîna taybet a nivîskara romanê ne asan bû. Paş ku çavên wê rohiya jînê dîtin, dayîka wê koç a xwe ya dawî kir. Ew di saya xûşka xwe ya mezin de mezin bû, û gelek dereng mêr kir. Paş çend salan mêrê wê jî mir. Tevî ku dota wê **Katoko** jîna wê piçekî geş kiribû, hema dîsa jî şînî, êş û kelem û bêzariyê perdeyên xwe bi ser dilê wê de berda bûn... Ji ber wê yekê, xanim **Morasakî Şîkîbo** dest bi nivîsandina çêroka **Cîncî** kir, da bi rêya wê têkiliya di navbera mêr û jinan de bi azadî bîne qelemkirinê. Di dema wê de zorbaziyeke bê wekanî li ser jinan hebû. Ne tenê di nav çînen hejar de, belku hîn bêtir di nav çîna navîn û arîstokratan de. Bo wan rûmeteke mezin bû, ku ewana dotên xwe yên ciwan bidine şah û Împeratorên pîr bûne, da ewana bi wan re rakevin. Ev rewş wekî rewşa paşeyên „xelîfeyên“ Imperatoriya Osmanî ye, ku bo her yekî ji wan bi hezaran jin û keçikan her amadekirî bûn, da bi wan re li gan kevin. Di romana **“Sultane”** ya **Colin Falconer** de li ser **Osmanîyan** û keriyên jinên wan baş hatiye gotin.

Cîncî, ku lehengê romana **Morasakî Şîkîbo** ye, kurê Imperatorekî ye ji jinekê ku bavê wê di zarotiya wê de miribû, û ji ber vê yekê wê pir ji Imperator hez dikir. **Cîncî** li ber dilê Imperator kurê bihatir û nêztir bû û hez dikir, ku wî têxîne ciyê kurê xwe yê rêbazî di deselatê de, hema wî baş dizanî ku wê tevlîheviyekê di koçka xwe de pêda bike, neyarêd wî wê li wî rabin û wê yekê ji xwe re bikine egera serîhildanê li deselata wî. Ji ber vê astengiyê rabû kurê xwe **Cîncî** ji malbata xwe bi dûr xist û navekî di dayê, ku ew di karmendiya deselatê de kar bike.

Di serî de bo **Cîncî** keçikeka ciwan ji keçikên di koçka Împerator de tînin, lê ji ber ku ew hîn xortek bû heznedikir wilo seriyê xwe têxîne hefsarê markirinê. Pişt re dibîne û dibihîse ku bavê wî paş mirina dayîka wî, wê keçekê li xwe mar bike, ku navê wê **Focî Tso Bo** ye û yeka wekî dayîka wî ye. Dilê wî bi ser wê ve çû, û di demeke dî de têkiliya xwe bi wê re pêda dike û zarokekî wî bi danga wê dikeve, lê ji ber ku ew jina bavê wî ye û **Cîncî** dixwaze ku bo wî jineka taybet hebe, ew ji xwe re li yeka dî digere, û pêrgî keçeka xweşik a bi navê **Morasakî** tê, ku hîn temenê wê 10 salin, wê direvîne, ku li gor daxwaza dilê mezin bike û bi wê re li gan keve.

Cîncî di nav lehengiyên xwe yên li ganketînê û hezkirinê de, têkiliya xwe bi dota neyarekî xwe yê mezin re pêda dike, ewê ji berpîrsên karmendên koçkê bû, ew neyar jî li delîveyeke wilo

digeriya, û kanî bû bi harîkariya dota xwe ya mezin, ya hêzdar bû û pir nevîna **Cîncî** dikir, navê **Cîncî** di koçkê de wêran û qerêj dike. **Cîncî** bi xwe dev ji koçka bavê xwe berdide û diçe li ber qeraxê **Soma** dijî. Ew li çol û beyaran digere û pir bîra **Morasakî** dike. Rojekê ew pêrgî bahozeke hovhêz ditê, ku hemahema jîna wî binve dike. Paşê pêrgî xanedanekî rûmetdar ditê, ku ewe **Cîncî** vexwendiyê baregeha xwe dike li ciyekî ku jê re dibêjin **Akaşî**.

Cîncî li **Akaşî** dibe davdiliyê dota wî xanedanî û zarokekî wî bi dangê wê dikeve. Kurê wê keçikê di demeke pêş de dibe Împerator û bavê xwe **Cîncî** bi xwe re radike cîgahekî civakî tev bilind di civak û dewletê de.

Cîncî ji xwe re keça şehzadeyekî ku navê wê **Asagao** ye tîne, hema hezkirin di navbera wan de pêda nabe, û li hev markirina wan tenha bo paristina cîgahê civakî bûye. Pişt re ew dota birayê xwe, yê ku ji bavê wî û ji jineka dî ya Împerator bû, destîne. Navê wê **Sozako** ye. Di wê demêjina wî ya hezkirî **Morasakî** nexweş dikeve û gelek dem ji dema **Cîncî** dibe. Di wê navê de hovemêrek jîna wî **Sozako** ji rê diêxîne û zarokek bi dangê wê dikeve. **Cîncî** pir hosan dibe û ew mêr ji ber şermbûn û fedîbûnê xwe dikuje. **Sozako** dibe evdaleka ku ji perestxaneyê dernakeve.

Paş du-sê salan jîna wî **Morasakî** dimire û jîna xweşik li ber çavên **Cîncî** tamsar dibe. Ew di salên xwe yê pêncî de dev ji jîna xweşiyarî û nazikî berdide û ew jî dibe evdalek di perestgehekê de û çend salan jîna xwe di wir de derbas dike û pişt re dimire.

Di pey wî re dîmenê, kurê **Sozako** dibe lehengê romanê û ew jîneke wilo bi jinan re dest pêdike...

Romanera Japonî **Cako Sîtoşî** ev romana gelek maldar bi dora 400 kesayetiyên cihêcîhê ji nû ve nivîsand û ne kêmtir ji 3 mîlyon lib ji wê firotin. Ta niha çêroka **Cîncî** 3 caran hatiye wergerandin bo Îngilîzî û bihinek zimanên dî jî heye...